

RISTEYÊN PEYWENDIYÊ Û PEYVRÊZIYA WAN (DEVOKA MÊRDÎNÊ) Relative Clauses and Their Word Order (Mardin's Accent)

Mikail BÜLBÜL¹

Kurte

Di kurmançî de navdêr hem bi awayekî pêşnavdêrî hem jî paşnavdêrî tên modîfîyekirin. Ligel rengdêr, temamker, çendîker û frazên daçekî risteyên peywendiyê jî bi awayekî paşnavdêrî navdêran modîfîye dikin û ji ber ku risteyên peywendiyê gelek taybetiyên risteyeke resen di xwe dihewînin, rewşa wan bêtir komplîke ye. Bi taybetî dema ku di risteyên peywendiyê de derçihî û navdêrandin pêk tê, peyvrêziya wan jî diguhere û li gor rewşa fokûs, promosyon û demosyonê hin formên nû peyda dibin. Risteyên peywendiyê û ev rewşên peyvrêziya frazên navdêrî di vê xebatê de bi daneyên ji devoka Mêrdînê û bi perspektîfeke tîpolojîk hatine vekolan.

Bêjeyên Sereke: Frazaya navdêrî, risteyên peywendiyê, modîfîyeker, sere, devoka Mêrdînê.

Abstract

Nouns are modified by the modifiers both prenominal and postnominal in Kurmanji. Beside adjectives, complements, adpositional phrases and quantifiers, the relative clauses modify the nouns, and including several features of full-fledged clauses, they are more complex. Especially when the extraposition and nominalization occur in the relative clauses, their word orders change according to the focus, promotion and demotion construction, and new forms of word order emerge. This paper deals with the relative clauses and noun phrase's word order according to data based on Mardin accent from the typological point of view.

Key Words: Noun phrase, relative clause, modifiers, head noun, Mardin's accent.

¹ Mamoste, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Çand û Zimanê Kurdî, mikailbilbil@hotmail.com

Destpêk

Fraz bi awayekî tradîsyonel girêdana du an zêdetir bêjeyan îfade dike. Lê bêjeyek bi tenê jî eger bi morfemeke bend (bound) hatibe diyarkirin an modîfîyekirin ew jî fraz e. Di teoriya tîpolojiya fonsiyonel (functional typology) de navdêrek bi awayekî tîpîk *sere* (head noun) ye. Ew sere hem ji aliyê sentaktîk hem jî semantîk, şiklê hebûna ku di hundurîne, diyar dike. Hemû elemanên din ên bi sereyê re tîpîk bikaranîn jî modîfîyekerên sereyê ne.² Lê wekî tîpîk zanîn gelek teoriyên sentaksê hene û dema ku teorî diguhere, dibe ku mane û tarîfên terman jî biguhere. Loma binavkirina frazê jî di hemû teoriyan de ne mîna hev e. Mesela di teoriya X-bar de sere ew bêje ye ku kategoriya xwe dide frazê.³ Lê di teoriya rêzimana dîskûrî ya fonksiyonel (Functional Discourse Grammar) de frazeke standart; divê *i*) xwedî sereyê navdêrî be; *ii*) hebûneke berbiçav (concrete) nîşan bide; *iii*) bi awayê leksîkal bê diyarkirin; û *iv*) bi awayekî referensiyal (referential) bê bikaranîn.⁴

Di frazeke navdêrî de sere û modîfîyekerên sereyê hene. Modîfîyekerên sereyê dibe ku morfemên bend bin hem peyvên leksîkal (lexical words) hem jî fraz û riste (clause) bin ku sereyê modîfîye dikin.⁵ Mijara me li vir tenê risteyên peywendiyê ne ku ji gelek aliyan ve taybetiyên risteyê normal nîşan didin, lê wekî modîfîyekerên navdêran tîpîk bikaranîn.

Yek ji egerên vê xebatê ew e ku li ser vê devokê û vê mijarê xebateke dîrekt nehatiye kirin. Her çend Îbrahîm Seydo Aydoğan⁶ di gotara xwe ya bi navê “Hevokên Kompleks” de bi sernavê *hevokên relatîf* behsa vê mijarê dike jî, ji gelek aliyan sînordar e û her wiha ne li ser bingeheke korpûsî ye. Ji aliyekî din ve jî hin xebatên korpûsî û kevin hene ku devoka Mêrdînê dîrekt an jî îndîrekt tîkildar dikin, lê ew jî behsa vê mijarê nakin û bêtir ji metnên folklorîk pêk tîpîk. Her çend ev xebat jî bo xebatên zimanî girîng bin jî, mijarên rêzimanî di wan de nînin. Du xebatên Hugo Makas devoka Mêrdînê tîkildar dikin ku yek jê rasterast li ser devoka Mêrdînê ye (*Dialekte Aus Der Gegend Von Mârdîn 1897-St. Petersburg*) û gelek tekstên herêma Mêrdînê tîpîk de cih digirin ku wergera wan jî tîpîk de heye. Her wiha di dawiyê vê xebatê de ferheng jî cih digire. Xebata Makas (1900) ya din jî (*Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Ge-*

- 2 Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume I*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. r. 59.
- 3 Carnige, Andrew. *Syntax, A Generative Introduction*, The Third Edition, A John Wiley & Sons. Ltd. Publication, Chichester /West Sussex- UK, 2013. r. 78.
- 4 Hengeveld, Kees. “Prototypical And Non-Prototypical Noun Phrases in Functional Discourse Grammar” in “*The Noun Phrase in Functional Discourse Grammar*”, editör. Daniel Garcí’a Velasco & Jan Rijkhoff, Mouton de Gruyter, Berlin, 2008. r. 43.
- 5 Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. r. 2.
- 6 Aydoğan, İbrahîm Seydo. *Guman-1, Demnasî, Hevoksazî, Watesazî û Gotar*, Weşanên Lîs, Ankara, r. 2013. 146 -149.

dicht Aus Gäwar; Jezidengebete- Heidelberg) her çend dîrekt ne li ser devoka Mêrdînê be jî, di asta fonolojîk û leksîkolojîk de berawirdkirina hin taybetiyên devoka Mêrdîn û Diyarbekirê tê de cih girtine. Ev herdu xebat di yek pirtûkê de hatine komkirin û di 1979an de li Amsterdamê dîsa hatine çapkirin.⁷ Her wiha du xebatên Helmut Ritter jî hene ku di 1968-9 û 1976an de çap bûne û li ser devoka Tor Abdîn in.⁸ Ji ber ku qîsmek devoka Tor Abdîn dikeve herêma Mêrdînê, ev xebat jî bi awayekî îndîrekt ji bo xebatên li ser devoka Mêrdînê girîng in. Lewra em dikarin bibêjin ku li herêma Mêrdînê du devokên sereke hene. Ev devok ji aliyê hevoksaziya xwe ve zêde ne dûrî hev bin jî bi taybetî ji aliyê bikaranîna kopûla û morfolojîya lêkeran ve tiştên cuda di navbera wan de pir in. Eger ji aliyê nêzîkbûna taybetiyên morfolojîk ve em li devokên herêma Mêrdînê binêrin, em dikarin wan bikin du devok: Yek jê devoka Tûr Abdîn e ku hin herêmên navçeyên Nisêbîn, Midyad û Stewrê dikevin ber vê devokê.⁹ Ya din jî devoka Omeriyan e ku Qoser, Dêrik, Şemrex, Mahsertê, navenda Mêrdîn û hemû beriya Mêrdînê û her wiha navçeya Serê Kaniyê ya Rihayê (ew jî dikeve beriyê Mêrdînê), nêzî vê devokê diaxivin. Loma di vê lêkolînê de, bi taybetî di cihên ku komplîke be, ji xebatên sehayî yên devoka Tûr Abdîn û Omeriyan gelek mînak hatin dayîn. Piraniya metnên sehayî ku mînak ji wan hatine stendin ji ber dengên teypê hatine nivîsîn û loma jî dema metin û dangan hev negirtine, dengên teypê referans hatine qebûl kirin. Qîsmek mînakên ku ne ji tekstên sehayî hatine dayîn jî, yên nivîskar bixwe ne ku axêverê zikmakî (native speaker) yê devoka Omeriyan e.

Risteya peywendiyê (relative clause):

Modîfîyekerên sereyê ji aliyê pozîsyona sentaktîk ve pêşnavdêrî (prenominal) û paşnavdêrî (postnominal) ne. Lê di kurmancî de modîfîyekerên piştî sereyê bêtir tînin bikaranîn û bêtir komplîke ne. Bi taybetî dema ku ji yekê zêdetir rengdêr navdêran modîfîye dikin û dema ku risteya peywendiyê (relative clause) navdêran modîfîye dike, bêtir komplîke ne.

Risteyên peywendiyê modîfîkerên navdêran in ku di asta risteyî de ne.¹⁰ Dema ku navdêrek ji aliyê risteyekê tê modîfîyêkirin ku bingihaneke (subordi-

7 Makas, Hugo. *Kurdische Texte im Kurmānĵi – Dialekte Aus Der Gegend Von Mārdīn & Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gäwar; Jezidengebete* APA - PHILO PRESS / AMSTERDAM- 1979.

8 Ev du xebatên Helmut Ritter ev in: 1. Ritter, Helmut. *Kurmānci-Texte aus dem Tūr'abdīn, I. Kārboran Oriens*, Vol. 21/22, 1968/1969. pp. 1-135. 2. *Kurmānci-texte aus dem Tūr'abdīn. 2. Yeziden*, Oriens, Vol. 25/26 (1976). pp. 1-37.

9 Li gor çavdêriyên me, sînorê îzoglosa Tor Abdîn, li rojhilat çemê Dicle û Çiyayên Gabarê, li rojhilat mentîqa Surgiciyan, li başûr Qamişlo û Nisêbîn û li bakur Hesenkêf e. Navçeyên ku bi vê devokê diaxivin ne homojen in. Lê yê herî homojen Hezex, Kerboran û Kercowsê xuya dikin. Navçeyên wekî Hesenkêf, Midyad, Stewrê, Nisêbîn jî qîsmen an jî bi giranî bi vê devokê diaxivin.

10 Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001. r. 175.

nator) “ku”yê peywendiyê di navbera sere (head noun) û risteyê de çêdike, ew riste dibe risteya peywendiyê û sereyekê modîfiye dike. Em ji bîr nekin ku di kurmancî de gelek fonksiyonên bingihaneka *kuyê* hene. Bikaranîna wê ya herî berbelav ew e ku dema risteyeke bingehîn (main clause) û risteyeke nebingehîn (subordinate clause) hebe wan bi hev ve girê dide. Eger em bi hinek mînakên îzah bikin:

- (1) **a.** Ez hatim *ku* te bibînim. (armanc)
b. *Ku* ew bê ez nayê. (şert)
c. Ji ber *ku* tu dereng hatî ew çû. (sedem)

Ji bo ku neyên tevlihevkirin em vê yekê bibêjin ku ev binristeyên jor tu navdêrî modîfiye nakin. Lê evên jorîn ne mijara me ne. Mijara me ew e ku dema risteyek, navdêrekî modîfiye dike. Wekî mînak dema em bibêjin “*hevalê ku do ez dîtibûm*” bêjeya *heval* ji aliyê *do ez dîtibûm* ve hatiye wesfandin ango modîfiyekirin û *ku* jî bingihanek e.

Gelo em çima risteyên peywendiyê bikartînin û ew riste ji ku tên? Dema em li hevokan dinêrin ku risteyên peywendiyê di wan de hene, em dibînin ku di eslê xwe de ji du îfadeyan pêk tên ku yek jê îfadeya bingehîn û ya din jî nebingehîn e. Lê îfadeya ne-bingehîn di forma risteyên peywendiyê de dibe parçeyek ji îfadeya bingehîn ku biker, bireser an jî pêkhêneke din a îfadeya bingehîn modîfiye dike.

- (2) **a.** Xwendekar mamoste dibîne. (*îfadeya bingehîn /main proposition*)
b. Mamoste pirtûkê dixwîne. (*îfadeya ne-bingehîn /subordinate proposition*)
c. Xwendekar ***mamosteyê ku kitêbê dixwîne*** dibîne. (*risteya peywendiyê*)

Bi mînakeke din a dirêjtir eger em rave bikin:

- (3) **a.** Mamosteyê kurdî xwendekarên beşa kurdî nas dike. (*îfadeya bingehîn*)
b. Xwendekarên beşa kurdî di dersan de serkeftî ne. (*îfadeya ne-bingehîn*)
c. Mamosteyê kurdî ***xwendekarên beşa kurdî ku di dersan de serkeftî ne*** nas dike. (*risteya peywendiyê*)

Li herêma Mêrdînê gelek formên wê yên wekî “*g/gi/go/ku/kû*” hene lê yên herî berbelav di devoka Tor Abdîn de *go* û di ya Omeriyan de *jî*, bi taybetî li beriya Mêrdînê *g/gi* xuya dike. Bikaranîna van bingihanekan herçend di kurmançiya standart de (bi awayê *kuyê*) tendanseke xurt be û di asta îcbarî (obligatory) de be *jî* di devokên kurmancî de opsiyonel e. Bikaranîna *kuyê* di govera Badînan

de jî dîsa bi arezûyî û obsiyonel e.¹¹ Li hin herêman her çend dîsa obsiyonel be jî bi awayekî xurt tê bikaranîn. Di du metnên (4902 bêje) devoka Mêrdînê de ji 79 cihên ku divê ev bingihaneke bihata bikaranîn 19 heb jê bi awayekî obsiyonel nehatine bikaranîn. Dîsa di van metnan de ji 79 bikaranînan 33 heb risteyên peywendiyê ne û navdêrekî diwesfnin:¹²

Tablo.1

Di çar çîrokên de hejmara giştî ya “g/gi/go/ku...”	“gi/go/ku...”yên ku nehatine bikaranîn	Risteyên peywendiyê	Risyeyên peywendiyê ku demê nîşan didin
79	19	33	17

Di kurmançî de wekî rêzik risteyên peywendiyê her dem piştî sereya modîfîyekirî tî û tu carî berî sereyan nayên. Eger em ji metnên sehayî mînakî bidin:

- (4) a. “... ew masiyê **gi ew dibê** ...”¹³
 b. “... cê **gi yendo l“serê Melê d“lê xistiya** ...”¹⁴
 c. “**Hevalê wî go pevra diçûne hêzinga** ...”¹⁵
 d. “... **zîlamê ku werê li vî sûretê meyzênê û keserek bidê**...”¹⁶

Çawa ku ji mînakên jor xuya dibe, riste bixwe wekî modîfîkerên navdêran hatine bikaranîn. Bingihaneke dema neyên bikaranîn jî tiştek naguhere û dîsa karê modîfîyekirinê dikin:

- 11 Omer Ehmed, Baiz. “Girê Di Dayalekta Serî Ya Zimanê Kurdî Da, Govera *Badîni*”, Kovara Za - koya Duhok, Perbenda 11, Jimare 1, 77-92, 2008. r. 82.
 12 Du metnên sehayî ku çar çîrok di wan de hene ev in. 1. Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çîrokên Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014. 2. Demirkaya, Îslameddîn, *Di Nava Eşîra Morîkan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
 13 Akbaş, Mehmet Şerif. *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 11.
 14 Baş, Abdülhekim. *Rêjeya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 7.
 15 Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengdêran), Di Devoka Herêma Kercewsê De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 19.
 16 Derin, İpek. *Frekança Tîpê Kurdî Devoka Nisêbinê da (Mêrdîn)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2014. r. 7.

- (5) **a.** "... Hesîbê *carê nanê wî divî ...*"¹⁷ (Hesîbê ku carê nanê wî dibe ...)
b. "*Tiştê mi gotiyî ...*"¹⁸ (Tiştê ku min gotiye ...)
c. "*Ew şikefta tê de ye ...*"¹⁹ (Ew şikefta ku tê de ye ...)
d. "... ew xeyala tu tê da ..." ²⁰ (... ew xeyala ku tu tê de ...)

Dema mirov li xebatên sehayî yên herêma Mêrdînê dinêre, mirov dibîne ku gelek caran risteyên pêwendiyê bêjeyên demê modîfiye dike. Jixwe ji *Tablo 1.* jî xuya dibe ku ji 33 risteyên modîfiyeker 17 heb jê wekî rola semantîk, demê nîşan didin. Bi taybetî bêjeyên *wext, gav, zeman* pir tîn bikaranîn:

- (6) **a.** "*Wexta'g mektûb dighêji xalî wî ...*"²¹
b. "... wexta *gi jê re taştiya wî anîn ...*"²²
c. "*Gava ku pîrê di xew re diçû ...*"²³
d. "... wexta ku *Şewlê Biçûk ji bo dîtina bavê xwe diçi stenbolê*"²⁴

Dema ku risteyên peywendiyê sereyeke demê modîfiye dikin sere bi awayekî anaforîk (anaphoric) di risteyê de cih nagirin. Lê dema ku sere, *ne navdêreke demê* be dikarin cih bigirin. Di metnên sehayî de jî cihnavên bêjeyî (lexical) bêtir, cihnavên enklîtîk (enclitic pronoun) -ê bi awayekî anaforîk tê bikaranîn ku bi piranî diçe dawîya daçekan û bi wan ve dizeliqin. Eger em li metnên sehayî binêrin em dikarin gelek nimûneyan bibînin:

- (7) **a.** "... ew şikefta *gi tê de ye ...*"²⁵
b. "... kêra *gi pê cebeş dişkenîni ...*"²⁶
c. "... şexsê *gi jê diqehiri.*"²⁷

17 Baş, h.b., r.13.

18 Baş, h.b., r.11.

19 Koşar, h.b. r.18.

20 İbrahimoglu, Şoreş, *Bikaranîna Lêkeran Ji Aliyê Binyadî Ve Li Herêma Qoser Ê Tûr Abidîn (Li ser Çar Çîrokên Herêma Qoser û Tûr Abidîn)*, Teza Xelaskirinê ya Lîsansê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê - Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, 2015. r. 20.

21 Akbaş, h.b., r. 22.

22 Koşar, h.b., r. 17.

23 Şimşek, Ahmet. *Rêjeya Bikaranîna Degan Di Devoka Kercosê De (Wek minak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 15.

24 Atış, Ali. *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016. r. 8.

25 Koşar, h.b., r. 18.

26 Akbaş, h.b., r. 16.

27 Ayta, Ramazan. *Çîrok û Çîrçîrokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 20.

d. “*Beroşek ji va yê mezin ê ku savarê tê de dikelandin...*”²⁸

Her çend li gor Ergin Opengin şaşî ye ku *sere* bi awayî cihnavkî û hevreferansî di risteya peywendiyê de bê bikaranîn jî,²⁹ bikaranînên jor vê yekê piştrast nakin. Mirov dikare bibêje ku tendanseke heye ku cihnavên anaforîk ên ku sereyan temsîl dikin zêde di risteyên peywendiyê de cih nagirin, lê ne ku şaş in. Sebeba ku zêde nayê bikaranîn jî bêtir bi mijara topîkalîteyê ve têkildar xuya ye. Lewra tesîreke xurt a topîkalîteyê li ser peyvêziya kurmancî heye. Mirov dikare bibêje ku pêkhênên topîk (ji ber ku ji konteksta berî xwe tînan) bi çend awayan rengvedana xwe didin riste an hevokan:

1. Pêkhênên topîk gelek caran bi cihnavên anaforîk tînan temsîlkin.
2. Pêkhênên topîk gelek caran dikarin neyên bikaranîn û ladan (deletion) pêk bê. (ladana bikerê, bireserê, biresera îndîrekt hwd.)
3. Dema ku cextkirineke xurt ji bo pêkhêneke topîk ne lazim be ji dêvla cihnavên bêjeyî cihnavên enklîtîk (-ê) dikare bê bikaranîn. Lewra cihnavên enklîtîk bê guvaş e.
4. Tiştê ku diyar dike ka gelo dê stratejiya *cihnavên anaforîk ên bêjeyî an enklîtîk* an jî ya *ladanê* bê bikaranîn, girîngbûn û li pêşbûna wê pêkhêne ye. Yanî eger cextkirin qet ne lazim be, em stratejiya *ladanê*; eger hindik lazim be em stratejiya *cihnavên anaforîk û bêjeyî*; eger qet ne lazim be em *cihnavên anaforîk ên enklîtîk bikartînin*.

Eger em veşerî ser mînakên ku me ji metnên sehayî girtibûn û dîsa li wan binêrin, em dikarin bibînin ku ji dêvla cihnavên enklîtîk bi hêsanî em dikarin cihnavên din jî bikarbînin:

- a. “... *ew şikefta gi di wê de ye ...*” (*wê* ji bo şikeftê hatiye bikaranîn)
- b. “... *kêra gi bi wê cebeş dişkenîni ...*” (*wê* ji bo kêrê hatiye bikaranîn)
- c. “... *şexsê gi ji wî diqehiri.*” (*wî* ji bo şexs hatiye bikaranîn)
- d. “*Beroşek ji va yê mezin ê ku savarê di wê de dikelandin...*” (*wê* ji bo beroşê hatiye bikaranîn)

Wekî me got bikaranîna cihnavên anaforîk (ên bêjeyî) ne tendanseke xurt e û ev yek di xebatên sehayî de jî pir eşkere ye. Lê ne ku bikaranîna wan şaş e; ji ber ku jixwe bikaranîna *sereyê* ya cara pêşî *sereyê* dike topîk û êdî pêwîstî dîsa bi bikaranîna wê ya anaforîk namîne û loma jî stratejiya herî xurt a di risteyên peywendiyê de dibe *ladan*. Dema ku em stratejiya *ladanê* bikarneynin û ji bo cextkirinê eger beşdarbûna *sereyê* ya nav risteya peywendiyê, bi strate-

28 Çoban, h.b., r. 19.

29 Opengin, Ergin. “*Repertûara Zimanî û Afrandina Edebî: Nirxandineke Zimannasî Li Ser Edebiyata Kurmancî ya Hevçerx*”, *Tîr û Armanc, Gotarên Rexneyî Li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*, Amadekar. Remezan Alan & Ergin Opengin, Weşanên Peywend, Stenbol, 2014. r. 181.

jiya cihnavên anaforîk nîşan didin jî em dibînin ku bi gelek rolên rêzimanî û semantîk di wan de dikarin peyda bibin:

- (8) **a.** *Zilamê gi min ew dîtibû ...* (min zilam dîtibû)
- sere, biresera dîrekt a risteya peywendiyê ye. (direct object)
- b.** *Zilamê gi min li wî dinêrî ...* (min li zilam dinêrî)
- sere, biresera îndîrekt a dîreksiyonel e (indirect directional object)
- c.** *Zilamê gi min pê nûs da wî ...* (min pê nûs da zilam)
- sere, biresera îndîrekt a datîf e (indirect dative object)
- d.** *zilamê gi min ji bo wî av anîbû ...* (min ji bo zilam av anîbû)
- sere, biresera îndîrekt a armançî ye (indirect benefactive object)
- e.** *zilamê gi ez bi wî re çûbûm ...* (ez bi zilam re çûbûm)
- sere, hokera bihevrebûnê ye (associative, manner)
- f.** *mala gi em li wê rûniştin ...* (em li malê rûniştin)
- sere, hokera cihî ye (locative, manner)
- g.** *kêra gi ez bi wê goşt jê dikim ...* (ez bi kêrê goşt jê dikim)
- sere, biresera îndîrekt a navgînî ye (indirect instrumental object)

Risteyên peywendiyê ji bilî ku demê û navdêrên din modîfiye bikin, gelek caran di metnên sehayî de, cihnavên *a/ê* jî modîfiye dikin ku *a* jî bo *mê* û *ê* jî ji bo hem nêr hem jî pirjimar tên bikaranîn. Ev cihnav wekî sere tên bikaranîn û bikaranîna van cihnavan gelek caran li gor kontekstê, anaforîk (anaphoric) in:

- (9) **a.** *“ê gi şertê mi jê neki, şertê mi dernexîni ...”*³⁰
- b.** *“yê ku gog diêxist refikê de...”*³¹
- c.** *“ê gi hat kuştin ...”*³²
- d.** *“ê gi vedigerin zinarê ...”*³³ (ji bo pirjimar)

Dema ku mirov li jor dinêre mirov dikare bibêje ku li şûna wan cihnavên jorîn *ev* û *ew* jî karîbûn di konteksteke anaforîk de bihatina bikaranîn. Yanî mirov karîbû wisa jî bigota:

30 Akbaş, h.b., r. 10.

31 Akıncı, Enes. *Bikaranîna Rengêran Di devoka Kerboranê De (Weke Mînak Du çîrokên Herêma Kerboranê)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2004. r. 10

32 Baş, h.b., r. 21.

33 Saruhan, Murat. *Bikaranîna Daçekan Li Herêma Mêrdînê (Wek Mînak Şeş Çîroka Hecî Ahmed Axa Û Reşo Kûrî)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 16.

- (9)' **a.** “*ewê gi şertê mi jê neki, şertê mi dernexîni ...*”
b. “*evê ku gog diêxist refikê de...*”
c. “*êwên gi vedigerin zinarê ...*” (ji bo pirjimar)

Lê her çend ew bikaranîn nêzî hev xuya bin jî hindik cudabûn di navbera şîroveya wan a semantîk de heye. Di vê xalê de em dikarin behsa du cudabûnên bingehîn bikin:

1. Cihnavên “*a/ê* li gor “*ev/ew*”ê bêtir ji bo rewşên cenerîk (generic) tên bikaranîn. Yanî hem *a/ê* hem jî *ev/ew* dikarin wekî cenerîk bên bikaranîn lê di rewşên cenerîk de bêtir *a/ê* tê bikaranîn.

2. Cihnavên *a/ê* li gor “*ev/ew*”ê bêtir ne-sînordar (non-restrictive) in. Lewra, her çend ji aliyê zayendî ve cudahî di navbera wan de tunebe jî, di cihnavên *ev û ewê* de maneya nêzîk û dûr jî heye û *ev* yek *ev û ewê* bêtir sînordar (restrictive)dike.

Risteyên peywendiyê dibe ku ji yekê zêdetir bên bikaranîn lê yek sereyê modîfiye bikin. Yanî du an zêdetir risteyên peywendiyê dikarin ji bo modîfiyekirina yek sereyê bên bikaranîn:

- (10) Bavê **gi** ji bo zarokê xwe diçûn şer dikirin **gi** zarokê wan hîn gelkî

1 3

ciwan bûn...

Di vê fraza (9)ê de sere *bav* e û ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatiye modîfiyekirin:

- (10)' **a.** *bavên ku ji bo zarokê diçûn şer dikirin*
b. *bavên ku zarokê wan hîn gelkî ciwan bûn*

Di xebatên sehayî de em zêde rastî nimûneyan nehatin ku bi du an zêdetir risteyên peywendiyê navdêrek hatibe modîfiyekirin. Dema ku tên bikaranîn jî, ji dêvla *kuyê* yan *gihaneka ûyê* tê bikaranîn an jî *tişte* nayê bikaranîn. Navbera du risteyên ku *tişte* tê de nayê bikaranîn, di axaftinê de bi *navbera kurt* (minor break) û di nivîsê de bi *bêhnokê* tê cuda kirin:

- (11) **a.** “...du eskerê *ku tivingê wan li milê wan û şûrê wan di destê wan de ne, zîlam tînine hizûra mîr.*”³⁴

34 Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengdêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014. r. 13.

b. “*Ewê go ketiyê xiznê û te girtî bavê min e.*”³⁵

Di hevoka (11.a.)yê û (11.b.)yê de sereyên fraza navdêrî ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatine modîfîyekirin. Di (11.a.)yê de du risteyên ku bi gihaneka ûyê ve hatine girêdan ev in:

- a.** du eskerê *ku tivingê wan li milê wan in*
- b.** du eskerê *ku şûrê wan di destê wan de ne*

Di (11.b.)yê de jî dîsa sereya hevbeş ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatine modîfîyekirin:

- a.** *Ewê go ketiyê xiznê (ewê ku ketiye xezîneyê)*
- b.** *Ewê go te girtî (ewê ku tu girtî)*

Risteyên peywendiyê ji ber ku kompleks in dema ji yekê zêdetir bin îfadeyê girantir dikin. Loma jî ji zimanê rojane bêtir di zimanê edebî de tîr tercîhkirin. Wekî mînak ji roman û çîrokeke nivîskarên Mêrdînê eger em du mînakan bidin:

(12) **a.** “*Ew qesr û malên ku di wexta xwe de şevan bi dehan mirov tê de radibûn û bi dehan tê de rudiniştin û temamê wan bi îkram, tê de bi xwarin û vexwarin dibûn...*”³⁶

b. “... qehwexaneya me ya ku li ber bahrê ya ku em û hevalan lê diciviyên û civanên me hema hema giş her dem li wir bûn ...”³⁷

Di hevoka (12.a.)yê de sereya fraza, *Ew qesr û malên ku di wexta xwe de şevan bi dehan mirov tê de radibûn û bi dehan tê de rudiniştin û temamê wan bi îkram, tê de bi xwarin û vexwarin dibûn* ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatiye modîfîyekirin:

- a.** *Ew qesr û malên ku di wexta xwe de şevan bi dehan mirov tê de radibûn û bi dehan tê de rudiniştin*
- b.** *Ew qesr û malên ku temamê wan bi îkram, tê de bi xwarin û vexwarin dibûn*

Di hevoka (12.b.)yê de jî seraya fraza *qehwa li ber bahrê ku em heval lê dicivin û civanên me hema hema her dem li wir e dîsa ji aliyê du risteyên peywendiyê ve hatiye modîfîyekirin:*

35 Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikartanîna Dangan Di Di Devoka Tor Abidîn De* Projeya Lisansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013. r. 22.

36 Ayebe, Lokman. *Gava Heyatê*, Weşanxaneya Belkî, Diyarbakir, 2007. r. 72

37 Bilge, Fewzî. *Dîn in*, Weşanxaneya Belkî, Diyarbakir, 2006, r. 19.

- a. qehwexaneya me ya ku li ber bahrê ya *ku em û hevalan lê dicivyan*
- b. qehwexaneya me ya ku li ber bahrê ya *ku civanên me hema hema giş her dem li wir bûn*

Dercihî (Extraposition) Di Risteyên Peywendiyê De

Di hin rewşan de dema ku lêkera risteya bingehîn dikeve navbera sere û modîfîyekerê wê û risteya peywendiyê piştî lêkera bingehîn tê, risteya modîfîyekerê jî diçe dawîya hevokê. Yanî risteya peywendiyê ji cihê xwe yê eslî der dibe ango dûr dikeve. Lê dîsa jî fonksiyona wê ya modîfîyekerî dewam dike. Di rewşên wisa de *îzafe* ku girêdana sereyê û risteya peywendiyê çêdike jî edî nayê bikaranîn:

- (13) a. *Mi do xwarinik gi mirov jê têr nedibû xwar.*
 b. *Mi do xwarinik xwar ku mirov jê têr nedibû. (dercihî çêbûye)*
 c. *Lawê wî yê ku ji welêt vegeryabû ket erdê.*
 d. *Lawê wî ket erdê yê ku ji welêt vegeryabû, (dercihî çêbûye)*

Dibe ku bi lêkera bingehîn re hinek pêkhênên din jî têkevin navbera sereya frazê û risteya ku wê modîfîye dike:

- (14) a. *Mi kincê ku nuh û rengorengo bûn* ji mirovê koçber re şandin.
 b. *Mi kinc* ji mirovê koçber re şandin *ku nuh û rengorengo bûn. (dercihî çêbûye)*
 c. Qemyona, *rêya ku me bi kevira çêkiribû* bi şiklekî pir xerab texrîb kiribû.
 d. Qemyona, *rê* bi şiklekî pir xerab texrîb kiribû *ku me bi kevira çêkiribû. (dercihî çêbûye)*

Baş e gelo ji ber çî egerên semantîk di risteyên peywendiyê de sere û modîfîyekerê wê ji hev dûr dikevin û lêker dikevin navbera sere û modîfîyekerê wê. Li gor David Banks têkiliya vê yekê bi kêmkirina asta kompleksbûna rêzimanî ve heye û li gor wî dema ku risteya peywendiyê biçe dawîya hevokê, bi vî awayî ji aliyê rêzimanê ve hêsantir dibe.³⁸ Hem jî barê risteya peywendiyê ku bi agahiyên nû barkirî ye, bi çûna dawîya hevokê siviktir dibe. Li gor ku Andreea S. Calud³⁹ (ji Rowley-Jolivet&Carter-Thoma⁴⁰) vediguhêze du sebebên pragmatîk hene ku

38 Banks, David. *There Is A Cleft In Your Sentence: Less Common Clause Structures In Scientific Writing*, asp 7/10, 3-11, 1995. r. 4.

39 S. Calude, Andreea. *Clefting And Extraposition In English*, ICAME Journal No. 32 (p. 7-33.), 2008. r. 12-13.

40 Elizabeth Rowley-Jolivet, Shirley Carter-Thomas. *Genre Awareness and Rhetorical appropriacy : Manipulation Of Information Structure*, by NS and NNS Scientists Sn The International Conference Sett. English for Specific Purposes, Elsevier Vol 24 (1), 2005. pp. 41-64.

dercihî çêdibe; yek dema ku dercihî çêdibe dînamîzma ragihandinê (communicative dynamism) xurttir dibe lewre agahiya nû ku bi risteya peywendiyê tê dayîn, diçe dawîya hevokê û bi vî awayî dînamîzmek çêdibe. Ya duduyan jî, dema risteya peywendiyê diçe dawîya hevokê tesîra vegotinê/belaxatê (rhetorically effective) xurttir dibe. Yanî em van fikran bi sê xalên girîng bibêjin:

Bi dercihiyê:

1. Hevok ji aliyê rêzimanî ve hêsantir dibe
2. Dînamîzma ragihandinê zêde dibe
3. Hêza vegotinê xurttir dibe.

Piştî van mînak û agahiyên eger em li mînakên ku di xebatên sehayî de derdikevin pêş binêrin, du bikaranîn bala mirov dikişîne:

1. Dema ku pêvebera risteya bingehîn lêkerî (verbal) be û ketibe navbera sereya modîfîyekerî û risteya modîfîyeker:

(15) a. *“Rojekê li ser rê çend mirovan dibînê ku digirîn”*⁴¹

b. *“... eyn tiştê gi digot, kitêb d’bêji.”*⁴²

c. *“... hestîkê mara bikevî destê te da ku ne bi van destan be dernekeve ...”*⁴³

Ev risteyên li jor dema em bala xwe bidinê xuya dibe ku pêvebera bingehîn a îfadeya bingehîn ku lêkerên hem ji aliyê demê ve hem jî kesî ve kişandî ne, ketibe navbera sere û risteyên modîfîyeker. Eger me risteyên jor bi awayekî normal û bê dercihî bigotina dê wisa bûna:

(16) a. *...çend mirovan dibînê ku digirîn (dercihî çêbûye)*

b. *...çend mirovên ku digirîn* dibînê (dercihî çê nebûye)

c. *... eyn tiştê gi digot, kitêb dibêji*(dercihî çêbûye)

d. *... eyn tiştê gi kitêb dibêji* digot(dercihî çê nebûye)

e. *... hestîkê mara bikevî destê te da ku ne bi van destan be dernekeve ...*
(dercihî çêbûye)

f. *... hestîkê mara ku ne bi van destan be dernekeve* bikevî destê
te da ... (dercihî çê nebûye)

2. a. Dema ku pêvebera risteya bingehîn navdêrî be û bi alîkariya kopûla bûbe pêveber û ketibe navbera sereya modîfîyekerî û risteya modîfîyeker:

(17) a. *“Ev çi îş e ku hûn dikin.”*⁴⁴

41 Güler, Şehmus. *Efsaneyên Li Ser Mêrdînê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, r.14.

42 Akbaş, h.b., r. 13.

43 İbrahimoglu, h.b., r. 21.

44 Koşar, h.b., r.16.

b. "... ew, xwirîniya wî ye gi pê taştê dixwe."⁴⁵

Wekî di risteyên jor de jî xuya dibe, taybetiya îfadeya bingehîn ew e ku divê pêveber ne lêkerî be, lê navdêr be û bi alikariya kopulayê bûbe pêveber. Eger em van risteyên jor bêyî ku dercihî çêbibe binivîsin, dê wisa bibin:

(18) a. Ev çi îş e ku hûn dikin.

b. *Ev çi îşê ku hûn dikin e.

c. ... ew, xwirîniya wî ye gi pê taştê dixwe.

d. *... ew, xwirîniya gi pê taştê dixwe ye.

Dema em li (18.b.) û (18.d.)yê dinêrin em dibînin ku dema em kopulayê piştî lêkera kişandî ya risteya peywendiyê tînin, rewşeke şaş û nerêzimanî derdikeve holê.⁴⁶ Di (16.b/d/f)yê de dema du lêkerên kişandî bi ser hev de hatin, rewşeke nerêzimanî û şaş çê nebû. Lê tê famkirin ku çê nabe ku kopûla piştî lêkerekê kişandî bê.⁴⁷ Îbrahîm Seydo Aydoğan⁴⁸ û Ergin Opengin⁴⁹ jî behsa vê meseleyê dike û ew vê yekê bi tesîra tirkî ve girê didin.

2. b. Dema ku pêvebera risteya bingehîn lêkera hebûnê be û ketibe navbera sereya modîfîyekirî û risteya modîfîyeker:

(19) a. "... *kurkî me heye go dibê ez nadim.*"⁵⁰

b. "*mêr hene karin serê te bipelçiqînin*"⁵¹

c. "... *şikeftek hebû jê re digotin Şikefta Erebo.*"⁵²

d. "... *hin eşqiya hene, bîst zencir kirina behrê ...*"⁵³

Di metnên sehayî de dercihî herî zêde bi vî awayî çêbûne. Di van xebatên sehayî de tiştêkî din jî bala mirov dikişîne ku dema lêkera hebûnê hebe û dercihî çêdibe, bingihaneka kuyê zêde nayê bikaranîn û dikeve. Eger me ew mînakên di (19)an de bê dercihî bigotina dê wisa bûna:

(20) a. "... *kurkî me go dibê ez nadim heye.*"

b. "*mêrên ku karin serê te bipelçiqînin hene*"

c. "... *şikeftek ku jê re digotin Şikefta Erebo hebû.*"

45 Koşar, h.b., r.15.

46 * di zimannasiyê de sembola ne-rêzimanîyê ye.

47 Hêjayî gotinê ye ku di kurmanciya nûjen de em dikarin li van şaşıyan pir rast bîn. Wekî mînak jî romana Nesîb Tarîm: "*Dengê heywanên ku wê şevê neçûbûn ser tewlên xwe bû*". (Tarîm, Nesîp. *Xezal*, Weşanên Belkî, Stenbol, 2007, r. 24.

48 Aydoğan, h.b. r. 147-148.

49 Opengin, h.b., r. 202.

50 Bulgan, h.b., r. 13.

51 Koşar, h.b., r. 15.

52 Saruhan. r. 19.

53 Derin, h.b., r. 6.

d. “... *hin eşqiya ku bîst zencîr kirina behrê hene...*”

Stratejiyeke din a dercihiyê jî heye ku her çend di metnên sehayî de ji bilî yek-du mînakan me peyda nekir, lê em dizanin ku di axaftina nav xelkê de heye. Ew jî dercihkirina beşek ji sereyê ye (em dikarin bibêjin, stratejiya kurtkirina sereyê). Em pêşî li mînakeke sehayî binêrin:

(21) “*Pîreka gi bi bavê min ri çûbû, navê wê Zero bû.*”⁵⁴

Di risteya (20)ê de bêjeya *navê* ku di eslê xwe de beşeke sereyê ye, ji cihê xwe dûr ketiye û dercihî derbas kiriye. Ev yek ji bo ku hindiktir komplîke be tê kirin. Loma me karîbû wisa jî bigota, lê fraz bêtir dirêj û komplîke dibe:

(22) “*navê pîreka gi bi bavê min ri çûbû, Zero bû.*”

Eger em bi hinek mînakên din vê yekê rave bikin:

(23) **a.** *Jina gi alîkariya me kir, destê wê şkestibû.*

b. *Texsiya gi min jê hez kir, xwediyê nedixebitî.*

c. *Telefona ku ez lê digeryam, rengê wê spî bû.*

Di van mînakên (23)an de beşek ji sereyê ji cihê xwe der bûne û fraza navdêrî kurt û hêsantir kirine. Eger me bi awayê dirêj bigota dê wisa bûna:

(24) **a.** *Destê jina gi alîkariya me kir skestibû.*

b. *Xwediyê texsiya gi min jê hez kir nedixebitî.*

c. *Rengê telefona gi ez lê digeryam spî bû.*

Dema ku mirov li rewşên dercihiyê dinêre, mirov dikare bibêje ku di hemû cureyên wê de tiştê hevbeş ew e ku ji bo kêmtir komplîke be, guhertin tîn kirin ku du pêveber bi ser hev de neyên. Dema mirov risteyên (23.a.b.c.) û (24.a.b.c.) yê dide ber hev jî ev yek eşkere xuya dibe. Di (24.a.b.c.)yê de du heb pêveber ku yek ya îfadeya bingehîn e yek jî ya risteya peywendiyê bi ser hev de hatine û ev yek wan bêtir komplîke dike. Mirov dikare bibêje ku fikra Banks ku dercihiyê bi kêmkirina asta komplîkebûnê ve têkildar dike, di cih de ye.

Dema mirov li sereyên frazan dinêre ku di xebatên sehayî de hatine bikaranîn, tiştêkî din jî bala mirov dikişîne ku risteyên peywendiyê bi modîfîyekerên din ên paşnavdêrî yên wekî rengdêr û frazên daçekî re zêde nayên bikaranîn. Her çend modîfîyekerên pêşnavdêrî yên wekî *nîşander* (ev/ew) *çendîker* (quantier) û *hejmar* pîr tîn bikaranîn jî modîfîyekerên paşnavdêrî hema hema nayên bikaranîn û di nav gelek xebatên sehayî de, tenê di yek-du nimûneyan de hebûn. Dema tîn bikaranîn jî dikevin navbera sere û risteya peywendiyê:

54 Saruhan, h.b., r. 19.

- (25) a. "... zîlamekî **feqîr, belengaz, jiderbketî** ku tî û birçî maye ..." ⁵⁵
 b. "Eskerên **li ber derî** ku wekî Ristemê Zal bûn ..." ⁵⁶

Navdêrandina (nominalization) Risteyên Peywendiyê:

Dema ku lêker fonksiyona navdêran bibîne û bibe argumenta lêkerekê din, navdêrandin pêk tê.⁵⁷ Risteyên peywendiyê di kurmancî de risteyên temam (full-fledged clause) in û lêker hem li gor kesan hem jî li gor dem, aspekt û modalîteyê wekî risteyeke normal û resen çêdibe. Dema ku lêkera risteya peywendiyê tê navdêrandin ango tê nominalîzekirin peyvrêziya risteya peywendiyê ji binî we diguhere û êdî ji holê radibe. Eger em bi mînakên vebêjin dê guhertinên morfo-sentaktîk ku tesîrê li peyvrêziyê dikin, çêtir bînin famkirin:

- (26) a. kêra ku mi zebeş pê jê dikir
 b. kêra jêkirina zebeşan ...

Di risteya (26.a.)yê de *jê kirin* wekî lêkerekê risteya peywendiyê hatiye bikaranîn. Lê di (26.b.)yê de navdêrandin pêk hatiye û lêker bûye sereya fraza daçekî. Yanî dema ku lêkera risteya peywendiyê tê navdêrandin êdî risteya peywendiyê ji holê radibe û peyvrêzî jî diguhere. Dema ku lêkera fraza peywendiyê wekî navdêr tê bikaranîn, rolên sentaktîk ên biker, bireser û pêkhênên din jî diguherin û êdî wekî modîfîyekerên wê lêkera navdêrandinê bikaranîn.⁵⁸ Mirov jî bo rewşa pêveberê ya morfo-sentaktîk jî dikare vana bibêje:

- a. Lêker êdî dikeve rewşa raderî (mesder) û dibe xwedî morfolojiya navdêran
- b. Lêker êdî wekî sere tê bikaranîn.
- c. Lêkera dema ku dibe navdêr morfolojiya *taf-aspect-modalîteyê* wenda dike.
- d. Lêker morfolojiya rêkeftina cihnavkî wenda dike.
- e. Sere wekî biker an bireser dikevin rewşa diyarkirî (genitive).
- f. Modîfîyeker dikarin lê zêde dibin.

Eger rewşa navdêrandina risteyên peywendiyê em bi mînakên îzah bikin, dê çêtir bê famkirin:

55 Çoban, h.b., r. 13.

56 Çoban, h.b., r. 13.

57 Hopper, P. and S. Thompson. *The Discourse Basis For Lexical Categories In Universal Grammar*, Language, 60, p. 703-750, 1984. r. 737.

58 Givon, h.b., Volume II, r. 24.

(27) a. sebeba *ku xwendekar nehatibûn...*

b. sebeba *nehatina xwendekara...*

Wekî berê jî hat gotin risteyên peywendiyê hemû taybetiyên risteyeke normal di xwe de di hewînin ku bi hemû cureyên lêkeran dikarin bên bikaranîn û biker, bireserên direkt û îndîrekt û hemû cureyên hokeran dikarin di wan de cih bigirin. Di *hevoka* (27.a.)ê de di risteya peywendiyê de bêjeya *xwendekar* wekî biker û *nehatibûn* jî wekî pêveber hatiye bikaranîn. Lê dema navdêrandin pêk tê, rolên rêzimanî jî diguherin û bêjeya *xwendekar* ku biker bû êdî ne biker e û wekî di (27.b.)ê jî xuya dibe wekî tamamkera bêjeya ku berê navdêr bû, karê modîfyekirinê pêk tîne. Dema em hokerekê li bikaranîneke wisa zêde bikin jî ferq nake û ew jî wekî modîfyekera wê bêjeya navdêrandî, tê bikaranîn:

(28) a. sebeba *ku xwendekar du roja nehatibûn...*

b. sebeba *nehatina xwendekara ya du roja*

Di (28.a.)ê de *du roja* wekî hokera demê lê hatiye zêdekirin, di (28.b.)ê de bi fraza navdêrî ve hatiye girêdan û wekî modîfyekera wê hatiye bikaranîn. Dema ku di risteyeke peywendiyê de lêker têper be û bireser jî bê bikaranîn dîsa ferq nake û ew jî wekî yên din dibe modîfyekera bêjeya navdêrandî:

(29) a. sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn ...*

b. sebeba *nexwarina nan ya xwendekara ...*

Di fraza (29.a.)yê de *xwendekar* biker *nan* jî biresera risteya peywendiyê ye. Lê di (29.b.)ê de dema navdêrandina lêkerê pêk tê, êdî *nan* û *xwendekar* wekî modîfyekera bêjeya navdêrandî tîn bikaranîn. Dema modîfyeker zêde dibin di nav wan modîfyekeran de rewş û rolên semantîk yên tîkildarî rêzbûna wan jî peyda dibin. Wekî mînak di guherîna fraza (29.a.)yê ya (29.b.)ê de du rewşên semantîk hene ku tesîrdar in li ser peyvrêzî ango sentaksê:

1. Fokûs: Dema ku zêdetirî yek modîfyekerê hebe û îzafeya fokûskirinê bê bikaranîn hêmana dawî bi *îzafeya fokûskirinê* tê bikaranîn. Mesela di fraza (29.b.)ê de fokûs li ser bêjeya *xwendekara ye*. Di wê frazê de *nan* û *xwendekar* herdu jî eger fokûs li ser *nan* bûya divê wisa bûya:

(30) a. sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn...*

b. sebeba *nexwarina xwendekara ya nan...*

Di (30.b.)yê de fokûs li ser bêjeya *nan* e û ew fokûs jî fokûsa dijber (contrastive focus) e. Fokûsa dijber jî li gor Givón axêver dema ji guhdar re tiştêkî

dibêje, li ser zanîna guhdar (hearer's knowledge) di nav hinek hêviyan (expectation) de ye ku ev hêviyên wî yên li ser zanîna guhdar dibe ku bi du xalên girîng ve girêdayî bin:⁵⁹

a. Nezanîn (ignorance): Guhdar wê agahiyê nizane.

b. Zanîna berovajî (contrary belief): Guhdar wê agahiyê berovajî dizane.

Yanî di fraza (30.b.)yê de, axêver fokûsê datîne ser *nan* ji ber ku axêver difikire ku:

a. Guhdar nizane sebaba nexwarina xwendekaran çî ye.

b. Guhdar difikire ku sebaba nexwarina xwendekaran X, Y, Z an tiştekî din e.

Ji bo fraza (29.b.)ê ku îzafeya fokûskirinê berî bêjeya *xwendekar* hatiye û modîfîyeker *nan* berî *xwendekar* hatiye jî heman tiştî em dikarin bibêjin.

2. Promosyon û Demosyon: Promosyon ango terfikirin, bilindbûna asta semantîk a pêkhêneke risteyê îfade dike. Bi taybetî di rewşa pasîf de dema em biresera risteyeke aktîf wekî bikera sentaktîk bikartînin, promosyon çêdibe. Yanî asta bireserê bilind dibe asta bikerê û ev yek jî promosyon e. Demosyon jî berovajî promosyonê diqewime, dema ku di asta hiyerarşiya topîkalîteya pêkhênê de nizimbûn çêbibe. Mesela asta bikerê dakeve asta bireserê ew jî dibe demosyon. Di navbera pêkhênên risteyê de ji aliyê topîkalîteyê ve hiyerarşiyek pêkhênên risteyê heye ku wekî pêşqebûl, ev hiyerarşî wisa ye:⁶⁰

Biker > biresera datîf/armancî > Objekta dîrekt > objecta locative > ên din

(Agt > Dat/Ben > Pat > Loc > others)

Heger em dîsa li frazên xwe vegerin:

(31) **a.** sebaba *ku xwendekara nan nexwaribûn...*

b. sebaba *nexwarina xwendekara ya nan ...*

Di fraza (31.a.)ê de bikera risteya peywendiyê *xwendekara* di (31.b.)yê de êdî ne biker e û demosyon derbas kiriye. Jixwe demosyon û ladana (deletion) bikerê asta pêkhênên din bilindtir û girîngtir dike.⁶¹ Lê rewşa pêvebera (31.a.)yê *nexwaribûn* berovajî ya demosyona bikerê ye. Ji ber ku pêvebera *nexwaribûn* di (31.b.)yê de bûye navdêr, bêtir derketiye pêş û di hiyerarşiya semantîk de girîngtir bûye. Jixwe pozîsyona wê jî guheriye û hatiye pozîsyoneke pêşdetir

59 Givón, h.b., Volume II, r. 125.

60 Givón, h.b., Volume I, r. 200.

61 Geniušiene, Emma. "Passives in Lithuanian (in comparison with Russian," in *Passivization and Typology Form and Function*, Editor: Werner Abraham & Larisa Leisiö, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, (p. 29-61). 2006. r. 41.

ku wekî Geniušiene dibêje pozîsyona pêşî pozîsyona herî tematîk (thematic) e û ya dawî jî ya herî rematîk (rhematic) e.⁶² Ji ber van hemû egeran em dikarin têkiliya peyvîzî ya bi demosyon û promosyonê bi kurta hî bi van xalan bibêjin:

1. Dema ku pêveber tê navdêrandin (nominalization) û wekî biker an bireser tê bikaranîn promosyon çêdibe û ji aliyê pozîsyona peyvîzîyê ve ber bi pozîsyoneke pêşdetir ve tê.

2. Dema ku bikera risteya peywendiyê ji bikerbûnê dikeve û demosyonê pêk tê û wekî modîfîyekerê pêvebera navdêrandî tê bikaranîn, ji aliyê pozîsyona peyvîzîyê ve ber bi pozîsyoneke paşdetir ve diçe.

3. Dema ku biker û biresera risteya peywendiyê wekî modîfîyekerê pêvebera navdêrandî tên bikaranîn, fokûs li ser kîjanê jî wan be, ew ji aliyê pozîsyona peyvîzîyê ve ber bi pozîsyoneke paşdetir ve diçe. Lewre wekî Geniušiene jî li jor gotiye, pozîsyona pêş a herî tematîk û ya paş jî ya rematîk e.

Rewşên semantîk ên wekî promosyon, demosyonê, ne tenê dema ku navdêrandin pêk tê çêdibin, dema ku dibin pasîf jî ew rewşên semantîk risteyên peywendiyê peyda dibin. Wekî me di serî de jî got, risteyên peywendiyê xwedî taybetiyên risteyeke normal in û çawa ku di risteyeke normal de biker, bireser, biresera îndîrekt, hoker tên bikaranîn, di wan de jî dikarin bên bikaranîn. Lê ferqa wan ew e ku navdêrekê modîfîye dikin. Dema em risteyeke aktîf dikin pasîf, em ji aliyê sentaktîk ve bireserê dikin bikera sentaktîk û wekî biker bikartînin. Ji aliyê semantîk ve jî em asta semantîk a bireserê bilind dikin ango promosyonê çêdikin. Dema ku bireser êdî şûna bikerê digire jî biker an tê avêtin an jî bi îfadeyên wekî “*ji aliyê ..., bi destê ...*” bi awayekî obsiyonel tê bikaranîn. Yanî biker demosyonê derbas dike û bireser jî promosyonê derbas dike. Ev tişt çawa ku di risteyeke normal de çêdibe, di risteyên peywendiyê de jî çêdibe:

(32) **a.** *Zilamê ku eskera ew kuştibû ...*

b. *Zilamê ku hatibû kuştin ...*

c. *Zilamê ku ji aliyê eskeran ve hatibû kuştin ...*

Di (32.a.)yê de risteya peywendiyê aktîf e û di (32.b./c.) de pasîf e. Dema ku di (32.b.)yê de risteya peywendiyê hatiye pasîfkirin, biker jê hatiye avêtin û biresera wê wekî bikera sentaktîk hatiye bikaranîn. Di (32.c.)yê de jî bireser dîsa wekî bikera sentaktîk e (ji ber ku lêker li gor wê tê kêşan) lê bikera mantixî (logical subject) jî bi awayekî obsiyonel hatiye bikaranîn. Eger navdêra modîfîyekerê û bikera risteyê heman be, çê nabe bibe pasîf. Ji ber ku di pasîfan de bireser dikeve şûna bikerê û bikerê bi awayekî sentaktîk (ne semantîk) ji risteyê davêje:

(33) **a.** *Zilamê ku nan xwaribû ...*

b. **Zilamê ku nan hatibû xwarin ...*

62 Geniušiene, h.b., r. 41.

Di pasîfkirina risteyên peywendiyê de xaleke din a girîng jî heye ku ew jî jêavêtina biresera îndîrekt a datîf e. Wekî tê zanîn di kurmancî de piştî lêkerên datîf biresera îndîrekt a datîf tê. Çawa ku di pasîfkirina risteyeke aktif û normal de datîf jê tê avêtin, ji risteyên peywendiyê jî bi awayekî îcbarî tê avêtin:

(34) a. *qelega ku Ehmed dabû min ...*

b. *qelega ku hat dayîn ...*

c. **qelega ku hat dayîn min ...*

d. **qelega ku hat dayînî min ...*

Di (34.a.) yê de biresera îndîrekt a datîf *min* e. Dema ku bibe pasîf bi awayekî îcbarî *min* jê tê avêtin û forma (34.b.) derdikeve holê. Di (34.c/d.) yê de *min* nehatiye avêtin û rewşeke ne-rêzimanî (non-grammatical) çêbûye. Dema ku risteyên peywendiyê dibin pasîf, di nav hemû pêkhênên çî îcbarî çî jî obsiyonel de tenê bireserên datîf mecbûr e ku jê bê derxistin.

ENCAM

Risteyên peywendiyê ku navdêran modîfiye dikin, gelek taybetiyên risteyeke normal di xwe de dihewînin û li gor modîfiyekerên din komplîke ne. Encamên sereke yên li ser risteyên peywendiyê û peyvrêziya wan ev in.

1. Tesîra mijara topîkalîteyê li ser beşdarbûn an beşdarnebûna serêyê ya nav risteya peywendiyê (bi rêya cihnavan), gelekî girîng e û ev yek bixwe jî tesîrê li peyvrêziya wan dike. Tiştê ku diyar dike ka gelo dê stratejiya *cihnavên anaforîk yên bêjeyî* an *enklîtîk* an jî ya *ladanê* bê bikaranîn, girîngbûn û li pêşbûna wê pêkhênê ye. Yanî eger cextkirin qet ne lazim be em stratejiya *ladanê*; eger hindik lazim be em stratejiya *cihnavên anaforîk* û *bêjeyî*; eger qet ne lazim be em *cihnavên anaforîk* ên *enklîtîk* bikartînin. Lê wekî tendans stratejiya herî xurt *ladan* e.

2. Her çend ji aliyê peyvrêziyê ve pozîsyona wan a paşnavdêrî naguhere û rijîd be jî hin rewşên din hene ku guhertin di wan de çêdibe. Bi taybetî dema ku dercihî çêdibe peyvrêziya wan diguhere. Dema ku lêkera risteya bingehîn dikeve navbera sere û modîfiyekera wê û risteya peywendiyê piştî lêkera bingehîn tê, risteya modîfiyeker diçe dawîya hevokê. Dercihî ji ber ku du heb pêveber, yek a risteya bingehîn yek jî ya risteya peywendiyê bi ser hev de neyên, tê kirin. Ji ber ku bikaranîna du pêveberan a bi ser hev de, bêtir komplîke ye. Di vir de taybetiya pêvebera bingehîn jî girîng e. Ji ber ku li gor rewşa pêveberê sê rewşên cuda derdikevin holê:

a. Eger ku pêvebera risteya bingehîn navdêrî be û bi alîkariya kopûla bûbe

pêveber û ketibe navbera sereya modîfîyekirî û risteya modîfîyeker, ev cure dercihî îcbarî ye. (*ev çi îş e ku tu dikî- *ev çi îşê ku tu dikî ye*)

b. Eger ku pêvebera risteya bingehîn lêkerî (verbal) be û ketibe navbera sereya modîfîyekirî û risteya modîfîyeker, ev cure dercihî obsiyonel e. (*ez mirovan dibînim ku digirîn- ez mirovên ku digirîn dibînim*)

c. Eger ku pêvebera risteya bingehîn lêkera hebûnê be û ketibe navbera sereya modîfîyekirî û risteya modîfîyeker, ne îcbarî be jî tendanseke xurt e. (*mêr hene ku karin serê te bipelçiqînin- mêrên ku karin serê te bipelçiqînin hene*)

3. Cureyekî din î spesîfik ê dercihiyê heye ku bi stratejiya kurtkirina sereyê çêdibe. Bi vî awayî beşek ji sereyê sînore frazê derbas dike û barê ku fraza navdêrî hildigire siviktir dibe. (*pîreka gi bi bavê min ri çûbû, Zero bû - navê pîreka gi bi bavê min ri çûbû, Zero bû*)

4. Dema ku risteyên peywendiyê tên navdêrandin peyvrêziya wan ji binî ve diguherin ku pêvebera wan wekî modîfîyekera sereya nû tê bikaranîn. (sebeba *ku xwendekar nehatibûn- sebeba nehatina xwendekara*). Di paşxaneyê semantîk a navdêrandinê de promosyon û demosyon û fokûs diyardeyên girîng in ku tesîrê li peyvrêziya wan dikin. Promosyon ango terfikirin bilindbûna asta semantîk ya pêkhênê demosyon jî nizimbûna asta semantîk a pêkhênê fokûs jî pêkhêna girîng îfade dike ku merkeza maneyê ye. Loma:

a. Dema ku navdêrandin pêk tê pêvebera risteya peywendiyê promosyonê derbas dike û dibe modîfîyekera sereyê û asta wê bilind dibe (sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn - sebeba nexwarina xwendekara ya nan*)

b. Dema ku navdêrandin pêk tê bi risteya peywendiyê demosyonê derbas dike û dibe modîfîyekera sereyê û asta wê dikeve (sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn - sebeba nexwarina xwendekara ya nan*)

c. Dema ku navdêrandin pêk tê eger hem biker hem jî bireser di risteya peywendiyê de hebe fokûs bêtir li ser kîjanê be bi îzafeya fokûskirinê tên bikaranîn û diçe ber bi dawiya frazê (ji (sebeba *ku xwendekara nan nexwaribûn e a. sebeba nexwarina xwendekara ya nan, fokûs li ser nan e. b. sebeba nexwarina nan ya xwendekara, fokûs li ser xwendekara ye*)

5. Dema ku risteyên peywendiyê tên pasîfkirin divê navdêra modîfîyekerî û bikera risteyê ne heman kes/tişt be. Ji ber ku di pasîfan de bireser dikeve şûna bikerê û bikerê bi awayekî sentaktîk ji risteyê davêje. (*zîlamê ku nan xwaribû - *zîlamê ku nan hatibû xwarin*). Risteyên peywendiyê û yên normal herdu jî dema tên pasîfkirin, eger di risteyê de, biresera îndîrekt a datîf hebe bi awayekî îcbarî jê davêjin. (*qelega ku Ehmed dabû min- *qelega ku hat dayîn min, min divê bê avêtin*)

Ferhengok

anaforîk	: anaphoric
bingihanek	: subordinator
cihnava enklîtîk	: enclitic pronoun
çendîker	: quantifier
datîf	: dative
demosyon	: demotion
dercihî	: extraposition
fokûs	: focus
fokûsa dijber	: contrastive focus
fraz	: phrase
hevok	: sentence
ladan	: deletion
modîfyeker	: modifier
modîfyekirî	: modified
navdêrandî	: nominalized
navdêrandîn	: nominalization
ne-sînordar	: non-restrictive
paşnavdêrî	: postnominal
pêkhên	: constituent
pêşnavdêrî	: prenominal
pêveber	: predicate
peyv rêzî	: word order
promosyon	: promotion
rêkeftin	: agreement
rematîk	: rhematic
riste	: clause
risteyên peywendiyê	: relative clause
sere	: head noun
sînordar	: restrictive
temamker	: complement
topîkalîte	: topicality

ÇAVKANÎ

Akbaş, Mehmet Şerif. *Di Devoka Qoserê De Rêjeya Bikaranîna Dengan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.

- Akıncı, Enes. *Bikaranîna Rengêran Di devoka Kerboranê De (Weke Mînak Du çîrokên Herêma Kerboranê)*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2004.
- Atış, Ali. *Di Devoka Çiyayê Mazî de Bikaranîna Hevalnavan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2016.
- Aydogan, Îbrahîm Seydo. *Guman-1, Demnasî, Hevoksazî, Watesazî û Gotar*, Weşanên Lîs, Ankara, 2013.
- Ayebe, Lokman. *Gava Heyatê*, Weşanxaneyê Belkî, Diyarbakir, 2007.
- Ayta, Ramazan. *Çîrok û Çîrçîrokên Kaniya Xezalan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Banks, David. *There Is A Cleft In Your Sentence: Less Common Clause Structures In Scientific Writing*. asp 7/10, 3-11, 1995.
- Baş, Abdulhekîm. *Rêjaya Bikaranîna Dengan Di Devoka Qoserê De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Bilge, Fewzî. *Dîn in*, Weşanxaneyê Belkî, Diyarbakir, 2006.
- Bulgan, Bilal. *Bikaranîna Hevalnavan (Rengêran) Di Devoka Herêma Kercewsê De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Carnige, Andrew. *Syntax: A Generative Introduction*. The Third Edition. A John Wiley & Sons. Ltd. Publication. Chichester /West Sussex- UK, 2013.
- Çoban, Mehmet. *Bikaranîna Rengêran Li Herêma Midyadê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Demirkaya, Îslameddin. *Di Nava Eşîra Morîkan De Rêjeya Zayenda Bêjeyan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Derin, İpek. *Frekansî Tipê Kurdî Devoka Nisêbinê da (Mêrdîn)-Rêjeya Bikaranîna Dengan* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Elizabeth Rowley-Jolivet, Shirley Carter-Thomas. *Genre Awareness and Rhetorical appropriacy : Manipulation Of Information Structure*, by NS and NNS Scientists Sn The International Conference Sett. English for Specific Purposes, Elsevier Vol 24 (1), pp. 41-64, 2005.
- Geniušiene, Emma. “*Passives in Lithuanian (in comparison with Russian)*” in *Passivization and Typology Form and Function*, Editor: Werner Abraham & Larisa

- Leisiö, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, (p. 29-61), 2006.
- Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume I*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001.
- Givón, Talmy. *Syntax, An Introduction, Volume II*, John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia, 2001.
- Güler, Şehmus. *Efsaneyên Li Ser Mêrdînê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Güneş, Mehmet Bakır. *Rêjeya Bikartanîna Dengan Di Di Devoka Tor Abdîn De* Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Hengeveld, Kees. “*Prototypical And Non-Prototypical Noun Phrases In Functional Discourse Grammar*” in “*The Noun Phrase in Functional Discourse Grammar*”. editör: Daniel Garcí’a Velasco & Jan Rijkhoff, Mouton de Gruyter, Berlin, 2008.
- Hopper. P. and S. Thompson. *The Discourse Basis For Lexical Categories In Universal Grammar*, Language, 60, p. 703-750, 1984.
- İbrahimoğlu, Şoreş. *Bikaranîna Lêkeran Ji Aliyê Binyadî Ve Li Herêma Qoser û Tûr Abdîn (Li ser Çar Çîrokên Herêma Qoser û Tûr Abdîn)*, Teza Xelaskirinê ya Lîsansê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê- Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, 2015.
- Koşar, Fikret. *Bikaranîna Rengdêran di Çîrokên Devoka Qoserê (Mêrdînê) de*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.
- Makas, Hugo. *Kurdische Texte im Kurmânji – Dialekte Aus Der Gegend Von Mârdîn & Eine Probe Des Dialektes Von Diarbekir; Ein Gedicht Aus Gâwar; Jezidengebete* APA - PHILO PRESS /AMSTERDAM- 1979.
- Omer Ehmed, Baîz. “*Girê Di Dayalekta Serî Ya Zimanê Kurdî Da, Govera Badînî*”, Kovara Zankoya Duhok, Perbenda 11, Jimare 1, 77-92, 2008.
- Opengin, Ergin. “*Repertûara Zimanî û Afîrandina Edebî: Nîrxandîneke Zimannasî Li Ser Edebiyata Kurmancî ya Hevçerx*”, *Tîr û Armanc, Gotarên Rexneyî Li ser Edebiyata Kurdî ya Modern*, Amadekar. Remezan Alan & Ergin Opendin, Weşanên Peywend, Stenbol, 2014.
- Ritter, Helmut. *Kurmānci-texte aus dem Tûr ‘abdîn, 2. Yeziden*, Oriens, Vol. 25/26, pp. 1-37, 1976.
- Ritter, Helmut. *Kurmānci-Texte aus dem Tûr ‘abdîn, I. Kārboran* Oriens, Vol. 21/22, pp. 1-135 2, 1968/1969.
- S. Calude, Andreea. *Clefting And Extraposition In English*, ICAME Journal No. 32 (p. 7-33), 2008.
- Saruhan, Murat. *Bikaranîna Daçekan Li Herêma Mêrdînê (Wek Mînak Şeş Çîroka*

- Hecî Ahmed Axa Û Reşo Kûrî*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Şimşek, Ahmet. *Rêjeya Bikaranîna Dêngan Di Devoka Kercosê De (Wek mînak Şeş Çîrokên Herêma Kercosê*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2013.
- Tarim, Nesîp. *Xezal*, Weşanên Belkî, Stenbol. 2007.